

DI ÇARÇOVEYA ETÎK Û EXLAQÎ DE TEVGERÎN

(RASTÎ, EMÎNÎ Û HEQPERWERÎ)

إِنَّ اللَّهَ يَأْمُرُكُمْ أَنْ تُؤَدُّوا الْأَمَانَاتِ إِلَىٰ أَهْلِهَا وَإِذَا حَكَمْتُمْ بَيْنَ النَّاسِ أَنْ تَحْكُمُوا بِالْعَدْلِ ۚ إِنَّ اللَّهَ نِعِمَّا يَعِظُكُمْ بِهِ ۗ إِنَّ اللَّهَ كَانَ سَمِيعًا بَصِيرًا

“Bi rastî, Allah ji we re ferman dike ku hûn emanetê bidin ehilê wê. Dema hûn di navbera mirovan de hukim dikin, bi edaletê hukim bikin. Allah bi vê yekê çiqas şîreteke xweş li we dike! Bêguman, Allah Semî‘ û Basîr e. Ew gotin û hukmên we bi temamî dibihîze û hemû kirinên we bi temamî dibîne.” (Nisâ, 4/58)

Misilmanên muhterem!

Hutbeya me dê li ser rastî, emînî û heqperweriyê be. Ev her sê, ji prensîbên bingehîn in ku mirov di çarçoveya etîk û exlaqî de li gor wan tevdigere.

Etîk, beşek ji ilmên civakî ye. Etîk, behsa maneya qîmet û qaydeyên exlaqî dike. Herwiha, dipirse ku ev qîmet û qayde li ser çi sedeman in û çima kirinek rast an xelet tê hesibandin.

Exlaq, taybetmendiyên manewî û xisletên mirovan in ku dibin sedem ku mirov baş an xerab were nasîn. Herwiha, tevgerên ku mirov bi îradeya xwe û bi tesîra van xisletan dike jî, di nav exlaq de ne.

Exlaq, zêdetir behsa qaydeyên ku di jiyanê de tên jiyîn dike. Etîk jî behsa fikirîn û hizirkirina li ser van qaydeyan dike.

Rêzgirtina qîmet û qaydeyên etîk û exlaqî, stûna sereke ya bûyîna insanê kamil e. Herwiha, ji bo ku mirov Misilmaniyê bi awayekî rast temsîl bike, lazim e ku van qîmet û qaydeyan biparêze.

Li gor Îslamê, divê rêyên ku digihîjin armancên meşrû, ew jî meşrû bin.

Ev nêrîn, li ser hin qîmet û qaydeyan hatiye avakirin ku di Qur’anê de bi eşkere û gelek caran tên te’kîdkirin. Ji wan jî rastî, duristî, edalet, riayeta emanetê, zirar nedana nîzama giştî û berdewamî di qencyê de ne.

Rastî, edalet, emanet û berpirsiyarî, di ayetên Qur’anê de tenê wekî fezîletên kesane nayên dîtin. Ew di heman demê de bingehê nîzama civakî û aştîyê ne.

“Ey kesên ku iman anîne! Ji Allah bitirsin û bi mirovên rast re bin.” (Tewbe, 9/119)

Ev ayet dide zanîn ku rêya exlaqî tenê bi hewldana kesane nayê parastin. Herwiha, bi şûra civakî xurtir dibe.

Yek ji te’kîdên herî xurt ên Qur’anê derbarê bicihanîna edaletê bi awayekî prensîbî de, ev ayet e:

“Ey kesên ku iman anîne! Li ser heqiyê bisekinin û bi hemû hêza xwe, di hemû karên xwe de edaletê bicih binin...” (Nisâ, 4/135)

Di vê ayetê de, tiştê ku taybet balê dikişîne, îfadeya “**qewwamîn**” e. Bi vê îfadeyê, ferman tê dayîn ku edalet were “**li ser piyan ragirtin**.” Ev yek ne tê wê maneyê ku mirov bédeng bimîne, lê tê wê maneyê ku mirov bi awayekî aktîf edaletê biparêze.

Di vê çarçoveyê de edalet, ne tenê qîmeteke razber e ku divê mirov pê bawer bike. Edalet prensîbek e ku tê jiyîn û tê jiyandin.

Herwiha, ayeta kerîme nîşan dide ku exlaqê Qur’anê evrensêl e û Qur’an ji van prensîban tawîz nade.

Li vir, tevgera exlaqî tenê wekî fezîleteke kesane nayê dîtin. Di heman demê de, wekî berpirsiyariyek ku bi imanê ve girêdayî ye, tê dîtin.

Di Qur'anê de, li gel rastî, edalet û emanetê, gelek qîmetên exlaqî yên din jî tenê te'kîdkirin. Wekî sebr, merhemet, efûkirin, tewazû, îffet, qenaet, wefa, amadebûna ji bo îstîşareyê, îtidal û denge.

Ev qîmet tenê fezîletên ku di hundirê mirov de pêş dikevin, nînin. Di heman demê de, di jiyana civakî de ji bo aramî, ewlehî û berdewamiya edaletê wekî temînatên tînin.

Di jiyana Pêxemberê me (s.a.s.) de, em nimûneyên herî xweş ên exlaqê dibînin.

Yek ji hedîsên ku di vê mijarê de tê bîra me, ev e:

“Ji rastiyê dûr nekevin. Ji ber ku rastî mirovan ber bi qencyê ve dibe, qencî jî mirovan ber bi cennetê ve dibe. Mirov her ku rast dibêje û rastiyê berdewam dike, di dawiyê de li cem Allah wekî ‘**Siddîq**’ tê nivîsandin. Yanî, rastî bûye parçeyek ji kesayetiya wî.” (Buxarî, Edeb 69)

Ev hedîs nîşan dide ku rastî ne fezîletek e ku tenê ji bo demekê be. Rastî yek ji stûnên bingehîn ên kesayetiya mirov e.

Derbarê ku exlaqê xweş yek ji sifetên bingehîn ên mu'mîn e, gelek hedîs hene.

Resûlullah (s.a.s.) dibêje:

“**Ji we kesê herî xêr, ew e ku exlaqê wî herî xweş e.**” (Muslim, Birr, 59)

Bi vê gotinê, Resûlullah (s.a.s.) te'kîd dike ku exlaq, di qîmet û bilindbûna mu'mîn de pîvana bingehîn e.

Ebû Zer (r.a.) dibêje ku Pêxemberê me (s.a.s.) ji wî re wiha got:

“**Li ku derê dibe bila bibe, li hember Allah berpirsiyariya xwe ji bîr neke! Piştî xerabiyekê, yekser qencyekê bike, da ku ew xerabiyê ji holê rake. Bi mirovan re jî bi exlaqekî xweş tevbigere!**” (Tirmizî, Birr, 55)

Ev hedîs tîne bîra me ku ji bo bûyîna Misilmanekî baş, tenê ibadet têrê nakin. Têkiliya mirov bi Allah re girîng e. Herwiha, lazim e ku Misilmanî di nav civakê de jî, di tevger û kirinên mirov de were dîtin.

Rojekê Pêxemberê me (s.a.s.) bi sehabe yên xwe re bû. Wî got:

«أَنْصُرْ أَخَاكَ ظَالِمًا أَوْ مَظْلُومًا»

“**Birayê xwe, çi zalim be çi mezlûm be, alîkariya wî bike.**”

Yek ji sehabe pirsî: “Ya Resûlallah! Em alîkariya mezlûm dikin, lê em ê çawa alîkariya zalim bikin?”

Pêxemberê me (s.a.s.) got:

“**Tu nahêlî ku ew zulmê bike. Ev e alîkariya wî.**” (Buxarî, Mezâlim, 4)

Ji vê hedîsê em fêhm dikin ku edalet tenê ew nîne ku mirov li kêleka mezlûm bisekine. Lazim e ku mirov zalim jî ji zulm û neheqiyê dûr bixe. Ev jî parçeyek ji edaletê ye.

Ji aliyê din ve, di ayet û hedîsan de derew, nemîme, xîbet kirin, îftira, kibr, îsraf, ruşwet, qezenckirina bi neheqî, xapandin û zulm bi êşkere hatine qedexekirin. Ji ber ku ev kirin zirarê didin civakê.

Di vê mijarê de, em dikarin vê hedîsa Resûlê Xwedê (s.a.s.) bibîr bînin:

“**Hûn di şeş tiştan de soz bidin min, ez jî ji we re kefîl bibim ku hûn bikevin cennetê:**

1- Dema diaxivin, derewan nekin.

2- Dema soz didin, soza xwe bi cih bînin.

3- Dema tiştêk ji we re tê emanet kirin, xiyanetê li emanetê nekin.

4- Çavên xwe ji haraman biparêzin.

5- Îffeta xwe biparêzin! Ji zinayê dûr bimînin.

6- Dest û zimanê xwe kontrol bikin. Wan ji haraman biparêzin.”

(Ehmed bin Henbel, Musned, 5/323)

Ev hedîs dide zanîn ku exlaqê Îslamê ji mu'mînan dixwaze ku ji tevgerên xerab xwe biparêzin û xwe kontrol bikin.

Di hedîseke din de wiha tê gotin:

«كَفَى بِالْمَرْءِ كَذِبًا أَنْ يُحَدِّثَ بِكُلِّ مَا سَمِعَ»

“Ji derewkariya mirov re bes e ku ew her tiştê ku dibihîze, bêje.”

(Ebû Dawûd, Edeb, 80; Muslim, Muqeddime, 5)

Herwiha, em dikarin vê hedîsê jî bibîr binin:

«وَمَنْ غَشَّنَا فَلَيْسَ مِنَّا»

“Kesê ku me bixapîne, ji me nîne.”

(Muslim, Îman, 164)

Di rîwayeteke din de jî Pêxemberê me (s.a.s.) dibêje:

«مَنْ غَشَّنَا فَلَيْسَ مِنِّي»

“Kesê ku bixapîne, ji min nîne.”

(Muslim, Îman, 189)

Xapandin, tevgerêke ku li ümmeta Resûlê Xwedê (s.a.s.) bê, nîne.

Bi kurtasî, prensîbên exlaqî yên ku di ayet û hedîsan de tên te'kidkirin, bi eşkere nîşan didin ku Îslam dixwaze exlaq di navenda jiyana mirov de be. Gotinên Resûlê Xwedê (s.a.s.) jî nîşan didin ku exlaq ne tenê tiştê e ku dîn temam dike; exlaq parçeyek bingeîn ji dîn e.

Di perwerdeya exlaqî de, tenê zanîna teorîk têrê nake. Lazim e ku mirov exlaq bi jiyîn û jiyandinê fêr bibe.

“Şîreta herî tesîrker, ew e ku mirov bi hal û tevgera xwe dide.” Herwiha, **“Pirsgirêk tune ku bi hal û tevgera baş neyê çareserkin.”**

“Kêmasiya cîhana Îslamê ne ilm e, ne teknoloji ye û ne jî dewlemendî ye. Kêmasiya wê ew e ku jiyana mu'mînan di hal û tevgerên wan de bi awayekî rast nayê dîtin.”

Di vê mijarê de, kesên ku bi exlaq û tevgerên xwe dibin nimûne, muesseseyên ku mirov pê bawer dîkin û şûra civakî gelek girîng in.

Bi kurtasî, lazim e ku her yek ji me, ji bo xatirê Rebbê xwe, Pêxemberê xwe û dînê xwe, bi hal û tevgerên xwe wisa be ku kesên li me dinêrin bibêjin:

“Di rûyê wî de derew tune.”

(Sohbet-i Canan, Mü'mince Görüntü ve Hal Dili)

Mizgînî ji wan kesan re be ku çawa qîmet û şerefa xwe diparêzin, wisa jî heq û hiqûqa kesên din diparêzin!

Mizgînî li wan kesan be ku di her halî de, di çarçoveya etîk û exlaqî de tevdigerin!

DI ÇARÇOVEYA ETÎK Û EXLAQÎ DE TEVGERÎN

(RASTÎ, EMÎNÎ Û HEQPERWERÎ)

إِنَّ اللَّهَ يَأْمُرُكُمْ أَنْ تُؤَدُّوا الْأَمَانَاتِ إِلَىٰ أَهْلِهَا وَإِذَا حَكَمْتُمْ بَيْنَ النَّاسِ أَنْ تَحْكُمُوا بِالْعَدْلِ ۚ إِنَّ اللَّهَ نِعِمَّا يَعِظُكُمْ بِهِ ۗ إِنَّ اللَّهَ كَانَ سَمِيعًا بَصِيرًا

“Bi rastî, Allah ji we re ferman dike ku hûn emanetê bidin ehilê wê. Dema hûn di navbera mirovan de hukim dikin, bi edaletê hukim bikin. Allah bi vê yekê çiqas şîreteke xweş li we dike! Bêguman, Allah Semî‘ û Basîr e.” (Nisâ, 4/58)

Misilmanên muhterem!

Îslam ji me dixwaze ku em di hemû jiyana xwe de bi exlaqekî xweş tevbigerin. Rastî, emînî, edalet û berpirsiyarî ji qîmetên bingehîn ên exlaqê Îslamê ne. Ji bo ku mirov Misilmaniyê bi awayekî rast temsîl bike, lazim e ku van qîmetan tenê bi gotinan nebêje, di jiyana xwe de jî bijî.

Exlaq, di têkiliya me bi Allah re û herwiha di têkiliya me bi mirovan re xwe nîşan dide. Mirovekî xwedî exlaq, rast dibêje, emanetan diparêze, soza xwe bi cih tîne, heq û hiqûqa mirovan diparêze û bi edaletê tevdigere. Edalet jî tenê ew nîne ku em alîkariya mezlûm bikin. Lazim e ku em li hember zulm û neheqiyê jî bisekinin û zalim ji zulmê dûr bixin.

Pêxemberê me (s.a.s.) dibêje: “**Ji we kesê herî xêr, ew e ku exlaqê wî herî xweş e.**” (Muslim, **Birr, 59**) Bi vê gotinê, em fêm dikin ku exlaq ne tenê tiştek e ku dîn temam dike; exlaq parçeyek bingehîn ji dîn e. Di jiyana Pêxemberê me (s.a.s.) de jî em nimûneyên herî xweş ên rastî, emanet, merhemet û edaletê dibînin.

Di heman demê de, Îslam ji me dixwaze ku em ji tevgerên xerab dûr bimînin. Derew, nemîme, xîbet kirin, îftira, kibr, îsraf, ruşwet, qezenckirina bi neheqî, xapandin û zulm hem zirarê didin mirov û hem jî zirarê didin civakê. Ji ber vê yekê, lazim e ku mu’min xwe kontrol bike û di gotin û kirinên xwe de baldar be.

Exlaq tenê bi zanîne nayê fêrbûn. Lazim e ku mirov exlaq bi jiyîn û jiyandinê fêr bibe. Şîreta herî tesîrker ew e ku mirov bi hal û tevgera xwe dide. Ji ber vê yekê, lazim e ku em bi exlaq û tevgerên xwe ji kesên din re bibin nimûne. Kesên li me dinêrin, divê rastî, emînî, edalet û exlaqê xweş di me de bibînin.

Mizgînî ji wan kesan re be ku çawa qîmet û şerefa xwe diparêzin, wisa jî heq û hiqûqa kesên din diparêzin!

Mizgînî ji wan re be ku di her halî de, di çarçoveya etîk û exlaqî de tevdigerin!